

Lênihêrîna kesekê/î ku bi penca giştî an hedarbûn derbas kiriye

Dibe ku ew nikaribin bi zelaî bifikirin û dibe ku 24 demjimêran piştî pencê an hedarbûnê li ser dadwerîya wan bandor bibe.

Di vê demê de, divê ew:

- ji zarok û kesên din ên di lênêrîna wan de ne berpirsiyar bin
- ne tirimbêlê bajon ne jî li duçerxê siwar bin
- ne xwarinê bipêjînin û ne jî makîneyek bikar bînin
- tu biryarên girîng nedin, heta eger ew difikirin ku ew xwe baş hîs dikin
- tiştêkî li ser medyaya civakî/forumên giştî parve nekin
- Alkolê nevexwin.

Ji we hatiye xwestin ku hûn xizmek an hevaleyê/î xwe bibin malê û agahdara wan bibin piştî hedarbûna wan ji bo çareserîkirinê an jî prosedurek di bin penca giştî de. Ev namilka agahdarîya giştî dide we ku ew çî bikin û çî nekin dema ku ew baş bibin û hûn çî hêvî bikin. Evê ji we re bibe alîkar ku hûn pêş de plan bikin.

Divê ez çî hêvî bikim?

Dermanê hedarbûnê an pencê dikare hîn nexweşan hinekî tevlihev bike û piştî çareserîya wan nerazî ne. Ya girîng, ew dikare bandorê li biryara wan bike da ku ew nikaribin bi zelaî bifikirin. Ev dibe ku heya 24 demjimêran berdewam bibe, ji ber vê yekê heya roja din. Divê hûn di vê demê de bi başî li ser wan çavdêri bikin. Ew dikare bibe alîkar ku hûn bifikirin ka ewê çawa îdare bikin gava ku ew ji nexweşxaneyê werin malê. Mînakek, hin kes dikarin wê alîkar bibînin gava ku nivînek li qata zemînê were veguheztin.

Ez kengê dikarim heval an merivê xwe kom bikim?

Karmendên li nexweşxaneyê tenê gava ku ew ji prosedurê baş bûne dê destûrê bidin wan ku biçin malê, û hûn li wurin ku bi wan re bibin alîkar. Ji ber ku nexweş 24 demjimêran piştî pencê giştî an hedarbûnê nikarin bajon, divê hûn mezinek jêhatî bin ji 18 salî mezintir û bi îdeal wan bi otomobîl an teksiyê bibin malê - ne bi veguhastina giştî.

Karmend dê nikaribin demek tam dakêşanê bidin we ji ber ku hin nexweş ji yê din dirêjtir dikişînin ku piştî penc, hedarbûn an neştergerîyê xelas bibin. Lêbelê, ji we re demek nêzik an hejmarek ji bo têlefônê were dayîn. Perstarê jî hejmara têlefona we hilde ji berku we re têkilî dayne. Ger nexweş nikaribe bimeşe, divê kursiyek bi teker were peyda kirin da ku ew bikaribe bi selamefî biçe veguhestina we.

Ma dê ji min re bê gotin ku ez çi bikim?

Bijîşk dê rênmaiên nivîskî yê taybêfî ji heval an merivê we re bide, ku divê ev be:

- dema ku ew diçin malê çi hêvî dikin
- talîmatên li ser xwarin, vexwarin û hildana dermanên wan ên normal piştî prosedûrê
- her tiştê guman ku meriv lê binêre û jimareyek ku meriv bi nexweşxaneyê re têkilî dayne ger pirsên we an wan hebin an jî ew xwe baş hîs nekin
- tiştên ku ew dikarin û nikarin piştî prosedûrê xwe bikin
- agahdarî li ser dermanên din ên ku ew hewce ne ku wan bigirin, wek sivikkirina êşê
- agahî li ser şuştin û lûnêrîna birînan. Divê hûn van talîmatan bi heval an jî xizmê xwe re bixwînin û ji wan re bibin alîkar ku hûn bişopînin.

Divê heval an xizmê min li malê çi bikin?

Ev ê bi corê prosedûra wan û talîmatên nexweşxaneyê ve girêdayî be. Bi giştî, divê ew:

- gelek vehesîn ji bo baş bûnê
- Ger ew bêserûber bin, bêalî nemeşin û bi îdeal xwe ji derenceyan dûr bixin
- bi agahdarî talîmatên nexweşxaneyê li ser girtina hildana dermanên wan ên asayî û her coreka zêde sivikkirina êşê bişopînin
- talîmatên ku ji aliyê nexweşxaneyê ve li ser xwarin, vexwarin û şuştinê hatine dayîn bişopînin.

Divê ew çi nekin?

Dibe ku ew nikaribin bi zelalî bifikirin û dibe ku 24 demjimêran piştî penckirnê an hedarbûnê li ser dadwerîya wan bandor bibe. Di vê demê de, divê ew:

- ji zarok û kesên din ên di lûnêrîna wan de ne berpirsiyar bin
- ne tirimbêlê bajon ne jî li duçerxê siwar bin
- ne xwarinê bipêjînin û ne jî makîneyek bikar bînin
- Alkolê nevexwin.
- tu biryarên girîng nedin, heta eger ew difikirin ku ew xwe baş hîs dikin
- tiştêkî li ser medyaya civakî/forumên giştî parve nekin.

Em gelek hewl didin da ku agahiya li vê namilkeyê durist lidar bixin û nûvejen bikin, lê em nikarin li vê ewlehî bikin. Em guman nakin ku ev agahîya gelemper bibe bersivên hemû pirsên we yê gengaz an jî bibe çareserîya her tiştên ji bo we girîng. Bi riya bikaranîna vê namilkeya ku wek pêşber, divê hûn bi tîma bijîjkî ra li ser bijarîyên û metirsîyên xwe bikevin nîqaşê. Divê ev namilkeya xwe bi xwe wek şêwirek neyê bidesthilgirtin. Ev jî bo armancek bazarî an jî karî nayê bikaranîn. Ji bo redandina berpisriyarîyê, ji kerema xwe ra li vir bifîkînin

(www.rcoa.ac.uk/patient-information/translations/kurmanji).

Hemû wergeran ji alî wergervanên ji civaka Translators Without Borders (Wergervanên Bêsinor) tî çêkirin. Çawanîya van wergeran jî bo duristîya van heta jî dest tê tî venihartin, lê xetere heye ku hin agahîyan nedurist bin û çewt hatibin wergerandin.

Ji me re bêje tu çi difikirî

Em pêşniyaran jî bo baştirkirina vê namilkê pêşwaz dikin.

Ger tîbînîyên we hene ku hûn dixwazin bighînin me, ji kerema xwe ji wan bi e-mail bişînin li ser: patiinformation@rcoa.ac.uk

Royal College ya Anestazîkera

Churchill House, 35 Red Lion Square, London WC1R 4SG
020 7092 1500

www.rcoa.ac.uk

Çapa Duyemîn, Sermawez 2021

Di nav sê salên jî roja weşanê ev namilkayê were nixandîn.

© 2021 Royal College ya Anestazîkera

Dibe ku ev namilka bi armanca hilberîna materyalên agahdariya nexweş were kopî kirin. Ji kerema xwe vê çavkanîya eslî binvîsin. Heke tû dixwaze beşek vê namilkê di weşanek din de bikar bîni, divê spashameyek guncan bê dayîn û logo, marqeb û wêne werin rakirin. Ji bo agahdariya bêtir, ji kerema xwe bi me re têkilî bikin.